NEWROZ

Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : **Newroz95@hotmail.com**

Hejmar (82) Ç.Pêşîn 2008 z-2620 k Buha (15) ps

Sûriyê û astengiyên jiyana rojane

Em dûr neçin , gava tu bala xwe didî rewş û jiyana xelkê Sûriyê bi tevahî , kefteleft , cefakêşî û nexweşiyên di nav civakê de , tu dibînî û dibhîsî ku çendî mirov mijûl û westa ye , bi xem û qiswet , bi derd û êş e ,..Bi tirs e!.

Li hêlekê , bihabûneke serberdayî ku stoyê piraniya xelkê badide û dihêle ku , mirov bona nanzikê bêtirî 12 se'etan bixebite û hêjî têrê neke . Û ji bilî pirsa nanzikê , pirsa biserîkirina xwendina zariyan û nemaze şûnketina pileya guhdanê di dibisatn û zanîngehên fermî de .

Li hêlekê , fatûrên avê , kehrebê û telîfonê û xwedê nekê lêçûna serdana doktûr û ezexanan . Û li hêleka dîtir , bêkarî bi xwe , evê ku roj ji rojê bêtir dibe û gelek nexweşiyên bi tirs bi xwe re, ji dizî û malxuriyê de bigir , ta tu bighê pevçûn û kuştinê tîne holê …vêca çûnhatina ber deriyên hekîm û hikûmetan , girtîgeh , parêzer û dadgehan . Û xwedê zanê (ew) lê digerin , polis û karbidestên dewletê , ên ku çavan digerînin û dev ji hev vekirine ku , çawa xelkê bidoşin , beriyan tije bikin , teşqelan û nerindiyan bihevxin , da ku xwe li ber vê yekê deynin , ji ber ku , ne berketiyê min û te ne , ne berketiyê miletê xwe ne , ..ne xema wan e , bila cixara wan pêketî be , û agir bi bêdera gund ketibe , ji ber ku ew bes ji xwe re ne û hew .

Li vê dawiyê , ji neçarî , ji dest bêkarî û xizaniyê , bi hezaran ji xelkê me yên Dêrîk û Dirbasiyê û wekî dî , dev ji gundên xwe berdane û berê xwe dane derdora Şamê , bihêviya ku – xwedêgiravî – karekî ji xwe re peyda bikin û herweha bi dehhezaran ji xelkê ereb ji herêmên Dêrazor û Reqê , ku rewşa wan ne kêmî wan kurdan e ger ne kambaxtir be . Bi ser de jî , herêmên parêzgeha Helebê, çi ji herêma Kobanî, Kurdax û wekî dî , bi hezaran xelk , nemaze xortên nûhatî û kirêkar, hurve wirve diçin û tên , bi hêviya ku karekî bi dest xwe ve bînin , anjî , riyekê ji riyan peyda bikin û xwe bighênin Qibris an Yonanê ...Hwd Tevdîr û fermanên **D.R.(11)**